Dumahîk : Ahenga Dêrika Hemko

3-Hêminê Mindanî: Ev şev li nik min wek destpêka karekî nuh û bi şiyan e lewma ew cihê rêz û rewazê ye di gel astengiyan û pîlanên xerab ji hemî aliyên jiyanê, ji layê zordarên Kurdan. Sala 2007an, ne gorî hêviyan bû, lehî û zevîhejînan pir qurbanî û zirarmend li paş xwe hiştin û ji layê rejîmê ve, pir guvişk û tengavî derbarê gelê Sûriyê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî bi karanîn. Ez dibînim sala 2008an wê baştir be, lê ez guman nakim ku wê li gor tê xwestin be. Bi hêvî me tevgera Kurd li gor hêviya miletê xwe be.

4-Ednan Beşîr: Ev şevek gelek baş û germ bû, van qîz û xortan ji me re li darxistin, bi rastî ne şevek normal bû. Helbest hinekî dirêj bûn,bi hêvî me miletê me, welatê me bikeve xêr û xweşiyê. Ya din, daxwza me ew e ku weşana Newroz bibe heyva ne, ji ber ku ew weşanek hêja ye.

5-Hozana Mîro: Rastî şevek gelek xweş bû, em pê gelekî kêfxweş bûn. Bi rastî helbest hinekî dirêj bûn. Xwezî çalakîn din hebana. hêviya min, sala nû xêr û xweşiyê bi ser miletê me de bênê, rêz û hurmeta min ji weşana Newroz re, bi rastî, ew weşanek zengîn û hêja ye.)6- Ednan Çaço: Evokat: Şevek gelek xweş e, bi rastî ciyê rêz û hurmrtê ye, helbestvan hinekî dirêj kir, lê dengê bilûr û bizqê

ew sarî şikand, rêz û hurmeta min ji weşana Newroz re, em bi hêvî ne serkeftin li pêş wê be. Hêvî û omîda min ji sala nû, ku miletê me di warekî xweş de jiyana xwe derbas bike, û ya giring hêviya min ewe ku lêvegera kurdî ava bibe, ji bo doza kurdî li sûriyê cihê xwe yê durst bistîne .

Weşana Newroz sipasiyên xwe pêşkêşî hemî beşdaran dike, bi hêviya ku sala nû, sala azadî, wekhevî û demokrasiyê be.

Nûnerê weşana:NEWROZ.(Dêrik)

Têbînî:

Ji bo çalakî û arîkariya **Komîta Dicle ya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Cizîrê** bi weşana me re, Desteya rêvebir a NEWROZ, sipasiyên xwe pêşkêşî wê dike, pêşketin, berdewamî û serkeftinê jê re dixwaze.

Enstîtuya Kurdî li Kölnê gavek e dîrokî avêt: Kurdên cîhanê bi rêya internetê ferî kurdî dikin

Enstîtuya Kurdî li Kölnê piştî amadekariyên dirêj, ji bo fêrkirina tevayê Kurdan li Cîhanê bi riya internetê kursa fêrkirina zimanê kurdî vedike. Kurs pêşî bi zaravayê kurmancî dest pê dike. Diyalektên din jî di rê de ne. Enstîtu dê tevayê bersivên xwendevanên zimanê kurdî yekser, bi riya internet anjî telefonê bide.

Li gorî zaniyariyên ji rêvebirya enstîtuyê hatiye girtin, kurs 26 ê sibatê saet 21.30 î dest pê dike. Mamosteyê kursê Fêrgîn Melêk Aykoç e. Kurs rojên Sêşem, Çarçem û Pêncşembê dê bête dayîn.

Zarathustra News - Ev navnîşana e-peyamê li hember spam bot'an tê parastin, ji bo dîtinê divê Javascript vekirî be